

HEJMAR


29

%100
KURDÎ

pîne

SALA ÇÛ NEDE DÛI..

KOVARA QERFÎ Û WÊJÛYÎ



kovara qerfî û wêjeyî ya nîv mehî 1-15 ocak (rêbendan) 2001

Sayı: 29

600.000 TL

CEJNA ÇI SERSALA ÇI...

DEWLETÊ BI KUŞTINÊ
BERSIVA ROJIYA MIRINÊ
DA... VE JÎ TERÊ NEKIR
SOZA XWE XWAR Û
TÎPA F JÎ VEKIR

GURÊ MANCO LI BER
DERIYÊ WE YE!

DERÎ VEKIN!!
ZUTÎPA F VEKIN
FERSEND ÇÊBÛ
..ZÛÛ!..



DAYÊ ŞEKİR!..

Ew, îro bi zarokên din re mal bi mal nagerin ji bo şekiran; xeyala şekir û şêraniyê nakin!.. Wan bi hev naguherînin!.. Lewre şekir mirinê tîne bîra wan!.. Pêjn û hilma mirinê ye!.. Wê nema ji bo şekir, ji kîsê dê û bavê xwe pereyan bidizin; an jî ji pînikê hêkan!.. Wê nema biçin ser etar û çerçiyên, da ku tîtik û tîştina jê bidizin!..

Ew, îro naçin serdana dê û bav, xwişk û birayê xwe yê li girtîgehê!.. Sol û kincên xwe yên nû, ku bi şev pê re rake-tin, nikarin nîşanî wan bidin. Û kes jî pêlîstok û tîtikên diyarî wan nake!.. Diyarîyên wan giş şewitînin!.. Bûn para **Gurê Manco!**..

Û îro ew naçin yarîgeh û parqê; wê biçin goristanê!.. Ji dêvla tîtik û pêlîstokan ve, wê bi kêl û bersalên goran şa bibin.

Û îro ew doza eydaniyê nakin. Pereyên xwe ji bêrika xwe demaxin û nahejmêrin!.. Naçin destê dê û bav, dapîr û bapîrê xwe!.. Û bi kêfxweşî kolonyayê li destê kesî nakin!..

Û îro ew naçin dikanê; **demaçeya patpatkan** (mantar tabancası), "qiz qaçiran", fûze û torpîdo nakirin; wan di qulikê moz û mêşan de nateqînin!..

Û ew îro tevî zarokên din nabêjin, "**serê salê binê salê xwedê kurekî/keçekê bide vê malê!**" Bi **Kalik û Pîrikê** re nadin çirtik û lotikan!.. Nabêjin, "**serê salê binê salê, pîrik qurbanê gunê kalê!**" Û wê nema şekirê qulqulî û cinciq bikeve xewna wan!..


Û hin jê jî wê şekiran berhev bikin, da ku bidin dê û bav, xwişk û birayê xwe!.. Dayê şekir bixwe!.. Bavo şekir bixwe!.. Nemirin!.. Ma kê bikaribe wekî we qala vê êş û janê, xax û hetûketiyê bike!.. Nemirin!.. Da ku ev êş û jan, karesat û reşekujî ji bîr neçe!..

Îro zarokên rojîgirê mirinê, berê yêngerîla û leşkeran!.. Êş yek e û diwartirîn e!.. Kula ser kulan e!.. Bila zarok bêyî mezinan werin cem hev, da ku aşî pêk werel!.. "Îro şîn e, tu zanî!.."

Heyran, hin camêran bi navê **Siyaset û Bilim** kovarek derxistiye. Ez nabêjim baş e, lê binêrin, ger we eciband bixwînin!.. (Dawiya dawîn me pêşniyara xwendina kovareke tirkî jî li we kir!.. Wê kevir bibarin!.. Na lol!.. Em ne dijminê tirkî ne!.. Gotina me ji kê re ye ew zanin!.. Xwediyê fisê bi xwe dihesel!..)

RZO-DIZO

IMAM cici



DOZO

BIRECAN



MELE

EŞREF MUMCU



SOSRETİK


EŞREF MUMCU





Diyaneta Tirkiyeyê dest avêt karê xwedê û got, "divê doktor mudahaleyî rojîya mirinê bikin!.."



Hêzên faşîst dîsa li cem destebirakên xwe cih girtin!..



Dewlet êdî bi saziyên xwe jî bawer nake!.. Daxuyaniya Dîwana Doktorên Tirk dewlet qanê nekiri!..




TeGoçî?

"ROJÎYA MIRINÊ LI DÎNÊ ME NAYÊ!.."

SEROKÊ DIYANETA TIRK MEHMET NURÎ YILMAZ



Dewletê jî bo ku girtiyên ku rojîya mirinê girtine, nekevîn ber efûyê, li dijî wan doz vekir û got, "we zerar daye malê dewletê!.."



PÊJNA EVÎNÊ

REWHAT



MURAD BATGI

muratbatgi@hotmail.com

SALA NÛ NEDIN DÛ!..

Îsal cejna Îsa û Mihemed li rast hatin. Kesên ku nexwestin dev ji herduyan jî berdin, li bazaran malik li xwe û li heftê û heft bavê xwe xera kir. Her çi çiqas em dibêjin hinek pereyan bidin saziyan jî, lê wisa dixuye ku "halkimiz" pereyê xwe di cejnên Îsa û Mihemed de diqedîne, ku hinek pereyên wî mabin jî, wê jî ji Cejna Mûsa û Dawûd re vedişêrin. Tobe be ku kesê rojî jî girtiye. Ku rojî girtibe jî tobe be ku di vê Remezanê de nimêj kiriye. Jixwe we pêşniyarên editorê me jî di ser guhê xwe re avêtin. (Min jê re got tu çi dibêji nêr e, gelê me dibêje bidoş, lê bi min bawer nekir...)

Ji ber ku em di feqîr û xizaniyê de ketine "Gueness Rekorlar Kitabî" me hem cejna Îsa û hem jî cejna Mihemed bê mesref derbas kir. Yanî em ne ji dêrê û ne jî ji mizgeftê man. (Her çi çiqas midurê me Seyit Karabaş ji ber pereyê ajandayan hem ji dêrê û hem jî ji mizgeftê ma be jî...) Ji hêlekê ve jî dibêjin we çima piştgirî nedaye rojiya birçîbûnê û rojiya mirinê. Bavo, jixwe em endamên xwezayî yên rojiya birçîbûnê û mirinê ne. Ê me di şêst rojan de na, di şeşsed rojan de jî tiştêk bi me nayê. Tew hinek dibêjin em ji hikumeta berê û vir ve di rojiya mirinê de ne, lê tiştêk bi me nayê. (Bimre faşizm...)

Gelo ji bo ku em hem ji dêrê û hem jî ji mizgeftê nemînin, di sala pêşiya me de, çi dikeve ser milê me û saziyên me û divê "halkimiz" çi bikel.

* Divê **HADEP** di sala 2001'an de ji tu kesî "özeleştirir" nexawze û tu kesî jî "eleştirmiş" neke. (Lewre dema "özeleştiriyê" dide mala xwe, "eleştiryê" dike jî, mala xelkê xera dike..)

* Divê **HADEP** nebêje emê bibin partiya Tirkîyeyê. (Lewre ev gotin şaş tê fam kirin û di encamê de **HADEP** nabe partiya Tirkîyeyê, dibe partiya tirkî...)

* Divê **HADEP** ji niha ve dest bi amadekariyên şahiya Newrozê bike û divê **Ferdûn Çelik** meşaleyê **Newrozê** îsal ji **Mozambîkê** pêxe.

* Divê hejmara cîgirê serokê **HADEP**'ê zêde bin û hejmar ji nehan derkeve heşt hezar û heftsed û pêncî û sisêyan. Piştî ku **Murat Boztrak** jî nexweş ket, dibe ku ev hejmara ku em dibêjin jî têrê neke. Wisa dixuye ku kesê ku nabin cîgirê serok, destê xwe nadine tiştêkî... Kesên ku dibin cîgir jî destê xwe dixin her derê...

* Divê nûçeyên bi kurdî yên **Medya TV** ji aliyê **Ozan Bangîn** ve werin pêşkeşkirin.

* Divê di şûna **Deniz Dargul** de bernameya "Dawiya Rojê" ji aliyê **Beytocan** ve were pêşkeşkirin. (Ji bo ku qirixên **Amedê** bêhtir beşdar bibin û lê temaşê bikin.)

* Divê **Navenda Çandê ya Jinan a Dîcleyê** ji niha ve serî lê bide, da ku tevî şahiya 23'ê Nîsanê bibe. Û ji bo organîzasyonê "yaxlî guresan" serî li waliyê Edimeyê bide.

* Divê ji bo xatirê **HADEP**'ê hunermendên **NÇM**'ê di bin xizmeta **Ferhat Tunç, Suavî û Edip Akbayram** bixebitin.

* Wekî hûn jî dizanin gelek hevalên me ji girtîgehan derketin û bi ihtimaleke xurt, wê di saziyêke me de bixebitin. Saziyên me ji bo ku van hevalan baştir bi cih bike, divê ezmûneke navendî ya memûran çêkin û van hevalan wisa bi cih bikin.

Ku hûn naxwazin hem ji dêrê û hem jî mizgeftê binînin, bê zehmet hinek guh bidine pêşniyarên me. Hûn di bin xêr û bereketa mele û papaz de bifetisin.

Cejna we û sersala we pîroz be!..



VÊ EVÎNÊ DIL JI MIN BIR, EZ BÛM EVDAL!



ROJÎ!..

Ev muxalifên çepgir... Aqilê kesî ji wan tiştekî nabire. Nimêjê nakin, eşheda xwe bi **Marks** û **Lenîn** tînin!.. Hec dûr e, fitre û zekat nîn e; dimîne rojî. Tu "**sê mehan**" li wî alî bihêle, Rojiya **Meha Remezanê** jî nagirin. Di meha bimbarek de, li nava çarşiyê, mîna ku henekên xwe bi feqîr û fuqareyên misilman bikin, kufekufa wan e; cixare dikişînin. Wexta fitarê misilmanên reben, zeytûnek pîroz diavêjin devê xwe, da ku xêra wan zêdetir bibe.

Ew çi dikin? Radibin şûşeya eraqê li ber xwe datanîn. Dewleta me ya pîroz, ji bo ku ew bi ser hişê xwe ve werin û bizanibin ezabê agirê doje-hê çawa ye, wan li girtîgehên dicivîne û li vê dinya ronî, nimûneyan pêşî wan dike. Lê belê tu li ku û aqilê çepgirên li ku? Gava xwedayê jorîn aqil belav kiriye, ew negihîştine ser. Şûna li xwe poşman bibin, tobe û estaxfara xwe bînin, di girtîgehên de; çinpina wan, pilepila wan naqede. Na, "cihê me teng nekin", na, efûya giştî derînin, na, em demokrasî û mafên mirovan dixwazin, na rewşa awarte rakin" û nizanîm çi...

Ka bala xwe bidinê, dewlet me ya pîroz bi dû axireta wan ketiye, ew doza çi dikin? Gava bi ya wan nabe, radibin rojiyê digirin. Rojiya wan mîna rojiya alemê bûya, tiştek nedibû. Na, her tiştê wan ji yê alemê der e. Rojî; bê sihor û bê fitar, bê av û bê zeytûn dibe? Zewêde bi xwe nakin. Û ne rojek ne dido; rojiyeke bêdawî. Jê re dibêjin rojiya mirinê. Di ser de, nêta xwe ya rojiyê jî nakin û sê caran nabêjin, "**Îşev ez bi nêt im, sibehê ez bi rojî me, rojiya meha remezanê, yarebî xwedê tu qebûl bikî!..**"

Ma wê xwedê vê rojiyê çawa qebûl bikî? Û rojiya ku xwedê qebûl neke, wê dewleta me ya pîroz çawa qebûl bike? Hezar hemd ji xwedê re ku, leşkerên dewleta me ya pîroz hene. Hezar spas ji leşkerên dewleta me ya pîroz re ku ew hem li dinya me hem li axireta me difikirin. Ew, me ji gunehkariyê diparêzin.

Ger girtiyên di rojiya mirinê ya ne li rê de bimirin, wê hemû herin doje-hê. Ku doje-hê tê bîra dewleta me ya pîroz, agir bi kezebê dikeve û dest bi operasyona "vejyandinê" dike. Ji bo ku bibin mînak, çendekên ji wan zûtir dişîne doje-hê, ku yên mayî xelas bibin. Lê belê ne xêr bi wan dibe, ne jî qencî. Ji bo ku girtî bizanibin, şewat û tîna agirê doje-hê çawa ye, hinek ji wan bi henekan, bi agirê vê dinyayê hate şewitandin.

Agirê vê dinyayê li hember agirê doje-hê bi heft avan hatiye şuştin. Dîsa jî mirov debar nake. Hezar hemd û sena ji xwedayê erd û asîman re dewleta me ya pîroz me ji agirê doje-hê diparêze. Û hezar hêvî û rica ji xwedayê mustesna re ku aqilêkî bide muxalifan!..

Dîroka van tîpan ji mêj ve dest pê dike. Padîşahê Osmanîyan **Abdulhamîd**, berê di van odayên zindanan de xulam û wezîrên xwe dixesandin. **Darwîn** jî, berî ku "şoreşa werarê (evrîm)" pêk bîne, di odayên mîna van piçûk de li ser guherîna gur, mêşingiv û kevokên pîr lêkolîn kiribû û gihîştibû vê encamê:

1- Gurê qusandî, di şeva reş de jî di şova reş de jî, giska reş kifş dike. 2- Mêşingiv heta ku kewareke hingiv çêke û bide, xwîna bîst mîlyon mirovan dimijie. 3- Kevoka ku pîr dibe, bi pençesêra azadîyê dikeve û tu celebên wekhevîyê "îçîne sîndirmîş" nake.

Vêga qewmîyeta gur, mêşingiv û kevokên pîr, ji ber analîza Darwîn, rikdarî û xwînkariyê dikin û bi niyet in di van odayên piçûk de dîlên fêris wekî fîndekê bihelînin û hestiyên wan bişînin ji **Navenda Antropolojîyê ya Osman Dûmûş** re.

TÎPA "BOLGE": Mîmar û projesazê vê tîpa girtîgehê OHAL e. Ji bo ku tava xwedê li bejn û bala gelên kevnare nede, hatiye çêkirin. Bi perspektîfên Karaoxlan bi rê ve tê birin. Ewlekariya wê ji qorîcî û hinek ceşîkên millî tê pirsîn. Bo guhdarên ezîz û dilovan, **Radîyoya Dengê Dîdeyê** bîst û çar saetan weşanê dike û klamên Îbo, Mahso û Îzo dibêje. Pêşerojê jî wê TRT bemameyên tirkmancî 'sunmîş' bike. Hinek rojên taybet konserên blues, rock, caz û opereya têne dayin. Lê dîsa jî kes lê guhdarî nake û her kes bi alîkariya devikên quşxane û sîltan Medya TV'yê temaşê dike. Her çiqas ku Mufetîşê girtîgehê **MR Mesut Yılmaz** dibêje, "Rîya cinetê di BOLGE re derbas dibe!", lê ev heştê sal e jî ji bilî melkematên cehennemê, tu eshabên xwedê derbas nebûne.

TÎPA "BEN ÖZGÜR ÜM": Ev girtîgeh wekî havîngehê jî tê bi kar anîn. Bi xêra şîfreyê **'Hızır Kartı'** mirov dikare bikevê. (şîfira wê: her şey çaklı taşı için...) Yê xwedîyê pasaportên sor û şîn bin, rêveberîya wê dikin. Ji bo qewmeke bastîrîn di qawîşa 'Derîn Dewlet'ê de dersên li ser 'Susurluk, Failî Meçhul, Darbe, Operasyon û Televole têne dayin. Heta niha du sed "memî manyaxî", sê sed xortûmkar û îşkencekar, şêst dizên xezîne û banqeyan, çil qunciknivîskarên ajan, piştî perwerdehiyê diploma wergirtine û bi navê "Ben Özgürüm" sond xwariye.

TÎPA XANA BAV DEMİREL: Ev tîp bi sponsora **Ege Bankası**, ji bo endamên malbata Demîrel hatiye çêkirin. Di vê girtîgehê de bi navê "BABA" kovarek edebî jî dertê û çîrokên 'Do do bû, îro îro ye' zêde balê dikşînin û bineaaleh têne ecibandin. Heta niha bi tenê **Murat Demîrel** û çend xulamên wî ketinê, lê li gorî agahiyên **Ahmet Altan** yê din jî di rê de ne.

TÎPA WÊ DINYAYÊ: Ev girtîgeh, ji bo mirovên ku li vê dinyayê cezayê xwe temam nekariye, bi alîkariya **Esat Oktay Yıldırım** û kûçikê wî Co li wê dinyayê hatiye çêkirin. Gardiyên wê Çatî û biraderên wî ne. Bi xêra **GBT** û teknolojiya pêşketî, mirovên 'bölücü, yıkıcı' di cih de têne pêşwazîkirin û ragirtin. Ji girtiyên herî navdar yê dawîn **Ahmet Kaya** ye. Remîxa 'cedin dede nesîn baba' û strana Müslüm Gürses ya bi navê 'biz babadan böyle gördük' bi şev û roj bi girtiyên didin guhdarîkirin. Li ser dîwarê wê jî welê nivîsîne: "Bijî biratî, yekîtî, alîkarî û piştgirîya girtîgehan!"


TÎPA YÖKÊ: Bi tenê xwendekar dikarin bikevinê. Lê dema ku bikevinê jî pirtûk, pênûs, defter, guhar, rih, kezî, cemedan, çav û mêjiyê xwe dispêrin simîtfroşê(?) ber devê derî. Xwendekarên jîr, heta ku bi şîretên Rektor **Kamal Gürüz** dersekê biqedînin, ji derve jî simîtfroş DNA'ya wan deşîfre dike û gazî **Xortum Silêman** dike. Ji ber teqiyên Torosan êdî kes demakeve derve jî.

EV DİLE KOÇER

ŞEKİRÊ QULQULÎ

CEM ŞEKER





VENGÊ MA BIRIYA...

Worê homa nevarabî serê zîndan, mayî homa girmaçik nedabî domanane vilê çewtan, mîrçikî homa neperabî serê viyalan, ma homa neveşbîme hewne sodîrî ra, şîma homa nanê xo wo sanî me werbî...

A rocê bombe varmayî zûza- qe zîndan, çersûn varmayî, adir varmayî serê xortan...

Peyniye dê 29 ten xortê ma merdî.

A rocê ez Stenbol de, Bulvarê Sîslerî de jû (yew) otelî de biyan. Le mi dê 6 xort estbî. Nî xortî sera 1996 dê kutbî rocê merdîşe.

Nî hevalan qese kerdîmê...

"Peşewê çaran" ama mi vîrî. Zîndanê Amedî de xo veşnabî. A ca ra tepiya rocê merdîşe 1984'î qese kerdîmê...

Peyniyê de vengê ma biriya. Vengê nekut vengê ma ser.

Her kes henî mend, xebera miriyaysan pît. Xeberî pêyder pey ama: 1, 2, 3, 4...

Xeberî kê amayî vengê ma tenê, tenê, senik, senik biriya şî...

A rocê heta sodîr nîştîmê ro. Sodîr kê bî recefiyayî mê, veştîmê ra, kutîmê wertê Stenbolî feteliyayî mê.

A rocê Stenbol çîmanê ma dê bî gonî...

A rocê Stenbol zerê hevalanê ma wo dirbetinan ra bî je (ze) awres rama...

A rocê...

Zîndanê Tirkîyee de 29 ciwan kîştî.

A rocê ra ber çîmanê ma ra hewnanê seran gurotî berdî.

Bêhewn...

Bêgirmaçik...


Bênan mendîme...

Şîma se mend?..

DOMANÊ ROJÎ




*CEJN, EYD.





WİİY!.. KURO CELO TU ÇI DIKÎ?!

WEY XANIMÊ!.. TU JI KU DERKETÎ KEÇÊ!.. WELEH EZ TIŞTEKÎ XERABNAKIM, LI FALA QÛNÊ MÊZE DIKIM!..



HÊÛY HÊÛY!.. XEFÛRÊ MIN MEZIN BÛYE, ÊDÎ CILÊN XWE EW BI XWE PÎNE DIKE?... EFERIM JI TERE KURO!..



HEVALNO EM DOST IN!...

BÊHENEKÎ?.. BAŞE! VÊ TIRPANÊHILDE Û GAZÎ HEVALÊN XWE BIKE, EM VÊ ZEVIYÊ BIÇININ!..

ÇIRTİKNAMEYA MÎN

- MEHMÛD XERÎBAN JI PARTIYA XWE HATE ÎHRAC KIRIN. MEHMÛDÊ ME WÊ ÊDÎ XEBATÊN XWE LI "PARTIYA YÊN KU BERA MIN DANE ORISPÎ ÇOCIXÎ NE" BIDOMÎNE. WÎ TENÊ Û BÊPIŞT NEHÊLIN!..
- SIBÊ PEVÇÛNA MÎN Û DAWAYA MÎN WÊ DI "GAWIR TV"YÊ DE YEKSER Û NEQLÊN BÊ WEŞANDIN! EZ MIHTACÊ ÇEPIK Û RÛNÊ WE ME!..
- XALÊ HECÎ XALTIYA FATÊ DI KADÎNÊ ÇAWA ZEFT KIR Û DI XWÊDANÊ DE HIŞTÎ!.. PIŞTÎ NÎVÊ ŞEVÊ DI "DOXIN TV"YÊ DE TEMAŞE BIKIN BIRÊZ HÊÇ Û HILORÎZADE NO!..



DAYO MEME!...

MMMMMM!



BAVO, ME GOT EYD E, EM HERIN WELET!... LÊ ME WEHŞÊ TRAFIKÊ NEXIST HESÊB!.. XEM NAKE!.. BAVO CEJNA TE PÎROZ Û BIMBAREK BE!..



QONAN



IMAM
GIGI



EZ DI HEFTÊ Û HEFT
BAVÊ WAN... ÊL
Û EŞÎRA!..

KURO HEYDO!..
DIVÊ EM ZÛ JI VIR
DERKEVIN!..



HIŞŞ...HIRÇA DILKEÇIK!..TU
ALİKARIYA ME
NAKÎ, EM JI VIR
DERKEVIN?!

SERÇAVA!



GARDIYAN!..ZÛ
WERE VÎ JI DESTÊ MIN
HILDE!..



MA ÇI LI TE QEWIMI
TU DÎSA
DIQIRI!..

WERE...
WERE...
AXX...

ZÛ VÎ
ÇEWALÎ HILDE!..
BISKÎWÎT ÇOCIXÎ
ZÊDE LI BER
XWE NEDA!..



KURO MA EV
CARA ÇENDANE!..
HAY JI DESTÊ XWE
HEBE GONCIK!..

ZINQ!..

HA
QUNDE!



KEREM KIN, VAN
ŞÛRAN JÎ HILDIN!.. Û
HAY JI NOBEDARÊN BER DERÎ
HEBIN!..



EZ TU CARAN WE JI
BÎR NAKIM!.. OXIRA WE
YA XERÊ BE!..



NOBEDARÊN KU HIRÇA
DILKEÇIK BEHS KIRIN, VA YE
LI VIR IN!.. HEYDO
ZÛ HERÊ!..



LÊXE HEYDO!..AVÊ
LÊ VENEXWE!..

GIMM!



DILTENIKÎ?! HEYRAN
MAEW ÇIYE!..?

DIMPL..





QONANVS



IMAM
GIGI



HA HA HA! HE HE HE!



ŞENQ!



KURO ŞERAB!



RAWESTIN!

NEKIN!.. LI MIN WERIN REHMÊ!.. EZ GORÎ!..



KA BISE!.. EM RIHÊ VÎ KUR BIKIN, DE KA KIJAN RÛVÊ BÊYOM Û KIRÊT DÊ JI BIN DERKEVE!..

XAŞ... XUS... XIŞ... CIRR!..



RÛVÊ TE YÊ RASTÛN KIRÊTIRE! HEYRAN ÇARDÛN RIHÊ XWE BERDÛ BAŞTIRE!.. GURÊ MANCO!..

OXX!.. ŞERAB XELASI! NIHA JÛ DORA ZERIYAN E FORÇÊ* ZÛ WERE BA MIN!..

*SÛRTÛK.



WISA NEKIN, EZ GORÎ!.. XWE BISPËRIN HEMBÊZA DEWLETA DILOVAN Û MIHRÛBAN!..



KIJAN HEMBÊZ?!.. YA KU GIRTÛNÛN DI ROJÛYA MIRINÊ DE BÛN, HEMBÊZ KIR GELO?!..




LÊ EW NEYARÊ KOKÊ DEWLETÊ NE!.. BISE!... TU MIN BI KUVE DIBÛ ŞIMBÊLBOÇO!..



EZÊ DEWLETA DILOVAN BISPËRIM HEMBÊZA HEYDO YA DILOVAN Û MIHRÛBAN!..

Cima?



NOŞ...

Pencereya Peyvê

ahmad.hussayni@nefel.nu



EHMED HUSEYİNÎ

Noş!! Bo berbanga rû şewitî ya penagehê.
 Bo destên Girê Mozan ku nîpelên zer ên axê bi hespên westiyayî dixemilîne.
 Bo çavşûnkên Girbanî, ku gerokên serdema rîzyayî bi lîlandina şîoran dinixumînin.
 Bo razên rêzên rêzdarên, bo birêzên nûjeniya ramanê.
 Bo lojîka gullebaranê.
 Bo sergejan, sergerdanan, bo berfa degehê. Nooş!!
 Bo kutîlkên Kurdistanê ku êdî nema dizanin geş bibin, bikenin.
 Bo avîna serjêkirî, bo kelaşê vîndê, bo nemana çîninê. Bo şîngûriyê, bo kunên reşî erebî, bo her çar stûnên derowîn ên pirtûka utopyayê.
 Bo roman û dîlan û xwepêşandana şoreşên beravêtî.
 Bo Laleş, bo pasvanê bêdengiya şevê.
 Bo seytanên Baudelaire. Bo Anahîta. Bo têkaserên şer û revê. Noş!!
 Bo ronşên bêbîr, dîl û lal.
 Bo mîrnîşîniya Bedirxaniyên Stockholm(!) bêpal.
 Bo sêrtakarên peyvê, dizên ji malê.
 Bo paytextên çanda nivîskarên şekirfiroş.
 Bo pirtûkên ku tu kes wan naxwîne.
 Bo aheng û şahiyên derçûna pirtûkên pepûkan.
 Bo siyasatmendên ku çavkaniyên wêjeya kurdî şêlê dikin.
 Bo projeyên bêkutayî yên çanda bi şîndemayî (!)
 Bo internetê, ku êdî projeyên mezin dî ber bi wê ve biçin.
 Bo televizyonên ku çelmişîna heyvên çavên dayikên me pêşkêş dikin.
 Bo rojnamevanên ku serçavkên me hildimeşînin.
 Bo kovarên nûdemîya me ku "hîsmendî û felsefeya hejmarê" bi ser birîna zimanê me de dirijînin.
 Bo wêneyên ciwan û paransya neynîkan.
 Bo navroten zûha û bazirganên eacr û talikan.
 Nooş!! Bo mirina ku xwe ji bîr dike.
 Bo welatê ku hişê xwe diwe.
 Bo mîletê ku xwîna xwe bi heskên paşerojê vedixwe.
 Bo maçên zûha û bêram. Bo ronişên ku êdî biranînan hembêz dikin, û nabêjin.
 Bo Praga ku Kafkayî perçeyên wê şêrêz dikir.
 Bo Feqîyê Teyran ku şêxê senanî di derya evîndê de bêmelevan hiştîye.
 Bo Rimbaud ku destê xwe ji peyv û hestan şuştîye. Noş!! Bo serkêşên tîving û pênuşê.
 Bo xemurên dirûka namûşê.
 Bo serokên bêpartî.
 Bo partiyên serok.
 Bo serokên bêqublenamê.
 Bo pêşmergeyên sed sala bîst û yekê.
 Bo desthilatê, bo kefteleftra nîşanên xebatê.
 Bo hêzên çêkirina niştiman.
 Bo şarezayên qirkirina laşê kurdan.
 Noş. Bo Kurmancîyê ku êdî ferhengê kurdî dî simbolên xwe yên qeytanî babide.
 Bo Medya TV ku xwêya zimanê tirkî û erebî bi ser birîna giyanê me de werî dike. Bo çanda sirgûnê!!
 Bo nivîskarên sirgûnê, lê diçûn havîngehên welat û tîr.
 Bo jixwebaneriya vê reş-gergerînekê.
 Bo nişîfên ku dî bi ser me de bîr!!
 Bo cigareya li xurîndê. Bo vê jiyana bêmezgînê.
 Noş!! Bo sersala we!
 Bo bîrsala we!
 Bo berhevkirina perçeyên nalîna ala we!

DIYALOGÊN SIST serok MUMCU

- YAW BOZO ABÊ HEQET MILET ÇIQAS EHMEQ E LOI ZEHMETIYA ROJYÊ LI KUÇE Û KOLANÊ BAJÊR DIDIN ÇIRTIK Û LOTIKAN. KURO JIYANEKE WIHA LI NAV DAR Û ZI-NARAN, LI KÊLEKA ÇEM, LI BER ORKESTRAYA ÇMKA VEXWARI-NA ŞERABÊ KA LI CENETÊ JI HEYE? JIXWE PIŞTÎ EWQAS DEWLEMEN-DÎ KU GOŞTÊ QELÛ JI HEBE, TU DI-KARÎ DÊ Û BAVÊ XWE JI BIFROŞÎ JI BO XATIRÊ VAN XWEŞIYAN, NE

Ji QÛNA MIN FÎRAR KIRI!..
- BOZO ABÊ!.. VÎ BÊAQILÊ SORO NIZANE HELBESTAN BIXWÎNE!.. KA EZ HELBESTEKÊ BIXWÎNIM...
- Ê LAWÔ, ÎRO ÎD EL. ROJ ROJA WE YEL. EZ BI QEŞMERIYA WE HÊRS NABIMI. KEREM KEL.
- ÎRO ÎN E, MELE DÎN E KÎRÊ XWE DI KULEKÊ DE DILEQÎNE
- HOŞSTL. BIRRSTL. WE XWE ZÊ-DE SIST KIRL. ERÊ ÎRO CEJN E Û BOZA ABÊ HÊRS NABE, LÊ NE EW-QAS JI LOL. KA EZ JI WE RE HEL-BESTEKÊ BIXWÎNIM, BIBÎNIN MÊR ÇAWA HELBESTAN DIX-WÎNINI.



NANEKÎ SAX
TEYFIKEK EPRAX
SATILEK MASTÊ QEREC-DAX
Û CIXAREKE QAÇAXI!..

KURO MIIN GOT, QA-CAX HATE BÎRA MIN. KA EM ESRAREKÊ BITEQÎNIN JI BO ŞE-REFA CEJNÊ. OOXL. WELEH JI BÊHNA WÊ KIFŞ E KU MALÊ EF-GAN EL. EZ XWE QURBANA VÎ MALÛ BIKIM, NÛR JÊ DIBARE.

WISA YÊ

- KURO WEKÎ MOZÊ NEKE WÎZE-WÎZ Û SERÊ ME NÊŞÎNE!.. KA JI ME RE HELBESTEKÊ BIXWÎNE!.. HEL-BEST Û ŞERAB, WEKÎ ŞÎR Û ŞEKIR IN; XWEŞ LI HEV DIKINI!..

- HEY YARA MIN A YAWŞAX HEY SOSRETA DÊLIK MIN BIHÎST TAYÎNA TE DERKETIYE ENQEREYÊ

Û MIN BIHÎST, TE GOTIYE 'EZ SORO NAKIM MENDÎL Û PÊ QÛNA XWE PAQJ NAKIM' EZ MIRIM, AGIR BI QÛNA MIN KET Û TIREK BÊDENG MELÛL MELÛL!..

- DIYARBEKIR ETRAFINDA TANQ-LAR WAR

QÛŞATMÎŞLER DÖRT YANINÎ!..

- KURO DORA TE YEL. DEV JI KILA-MÊ BERDE, BILA CIXARE VENEMIREL.

- BI ŞEREFÂ HECÎ, LI SER VÊ CIXA-REYÊ EBRÛ ŞALLÛ JÎ, LI BER MIN TA-ZÎ BE, EZ DEV JI CIXAREYA XWE BERNADIMI!.. NÎMETA MEZIN EV E BAVO, YÊ LI EBRÛYÊ SIWAR BE KER EL!..

XAÇETERS

	1	2	3	4	5	6	7	8
1				3	2			
2		5						
3								
4								
5						4		
6								
7							1	
8								


1- Destebirak û şîrikê Ecewît e; wekî şîr û şekir in. Destê wan ji hev nabe!.. Mazûbanê mirî û kuştîyan e. Bûroya wî li ser trafikê ye!.. Li cejn û eydan bîst û çar saetan dixebite; yanî navê kod ê Ezraîl. 2- Navê nijad û regeza kurdan (Tu dibê qey gelekî girîng e!.. Ji neçariyê me ev peyv xist xaçeteresê û me herimand!..) - Di zimanê heps û girtûgehê de navê stokê ye!.. (Burasî dördüncü koğuştur sayın abim!.. Ver bi cigara ... yanalm!) 3- Bi soranî başî û qencî. (Heyran divê hûn vî kerf

di vê borê re derbas kin!.. Bijî Yekîtiya Zimanê Kurdî Bimre Zaravaperest!..) 4- Her çend heywanekî baş û dilsoz be jî, mirovên zikreş û kumreş di hemû çêr û sixêfên xwe de navê wî hildidin; patner û badîgûardê dêlikê. - Bi zimanê Çarsim Axa (yanî ker) "ez ji te hez dikim" an jî "min aciz nekin, bicehimin ji vîr!.." 5- Tîpeke (herf) gelekî aşîxwaz e; di nava peyv û hevokan de wekî pireke kar dike; gihanekek - Dema diya we bixwaze ji we re bêje, "kuş beyinli" û mêjvala vê peyvê bi lêv dike. (Pirseke dijwar e em zanin!.. Lê hûn jî hinekî totika xwe bixebitînin!..) 6- Em jî nizanin çima, lê her tim ji ker de dikeve. ... ji kerê de ketê!.. - Dema boî ya rîtinê (Elo RTÛK!.. Ma hûn di xew de mane heyran!.. Xaçeters bû daşir û destavxane!..) 7- Ji zû de ye ku her kesî jî bîr kiriye. Dema yek dike, jê re dibêjin ehmeq; qencî, rindî. - Karê sereke yê kurdan!.. Bi hezaran sal e kurd bes vî karî dikin!.. Van rojan bi xêra agirbestê sekinîye!.. 8- Jê re bi zazakî het, kîşt, bi soranî lay an jî layen dibêjin. - Hesp dixwaze heta karî bixwe û pê bimire!.. Li ba hespan mîna esrar, marûana û bîrayê ye!.. Jê cureyeke "ava jiyane" tê çêkirin.



1- Newroz e Newroz e sibehê Newroz e! ... bide min yar!.. Malneketê Civan Haco jî mîna gayê hêç dibêje, "bidel!.. bidel!.." - Çepûrast li pîrsa pêncemîn binêre!.. - Ev peyv bêhemdî xwe kete xaçetersê!.. Wekî din me tiştêk peyda nekir!.. Cama ji bin mirovan jî diçe û bêhn didel!.. 2- Ji bo em vê peyvê têxin vir, me îmana xwe çikand. Ava jiyane ya sereke ye!.. Wekî Muslum Baba dibêje, yên ku vedixwin jî yên ku venaxwin jî dimirin!.. Ya belaş mele jî vedixwin. - De ka em ji bo vê peyvê çî binivîsin! Cihê ku hûn lê dimînin. Hêlîna mirovan!.. 3- Nîşaneyê bindestiyê ya herî mezin e!.. Dema em zarok bin bi hûçikê xwe, mezin bin bi tiliyê xwe paqij dikin!.. Gava hişk dibê, îmana kurdan pê tê û destê wan ji pozê wan demakeve; çilm, fis, - Dê û dapîrên me pê êş û kulên xwe rêstin; di civaka feodal de sanayiya tekstîlê. - Yên ku ji Îstistanê; navê kod yê Rihayîyan e. - Peyva ku "kendine sevdalî kişîlîk" pir jê hez dike; cinavkek. - Hin kes dema gazî diya xwe dikin dibêjin (De hûn jin bin, tê derx-in!..) - Cih û warê dengbêjan, lê berî her tiştî bajarê Şakiro, ku me ji yên wekî wî re digot, "ew ji xeynî lo lo û lê lê bi tiştêkî nizanin" - Tirmixa xort û qîzên evîndar; porê wan pê dibehel!.. 7- Tiştê ku Apê Marks jê re dibêje, "afyon", lê ku hê kesî pê nikariye!.. 8- Bi xwedê ji bo vê pîrsê divê hûn telefonî başûrê Kurdistanê bikin!.. Ma êdî hûn li tatîlê naçin wir? Navê navçeyê başûr!.. 8- Dema nêçîra min tê gûyê wê têt!.. Destebirakê nêçîrvan!.. - Bi zazakî ewro bi soranî emro (Heyran hûn jî destê me nafilîtin!.. Bimre Zaravaperest!..)

PEYVA ÎLLEGAL



Deh kesê ku peyva îlegal bibînin û bîşînin ser navnîşana Pîneyê, wê kasete ASIK ÎHSANI ya bi navê Kızıldere qezenc bikin.

Ji Weşanên Welat bixwazin



Amed
Kıbrıs Cad. Türk Hava Kurumu Apt.
Kat 4. Tel: 412 223 34 83

Wan
Belediye İş Merkezi
Kat 1. D 106
Tel: 0432 215 64 26

Batman
Yeni Mah. 711.Sok.
No: 27 Kat 2
Tel: 0 535 319 46 15


Riha
Kunduracılar Pazarı. Özpolat İşhanı. Kat 3/5
Tel: 0414 216 81 07

Edene
Kocavezir Mah.
Karacaoglan Cad.
Aziz Pamukçu İş Merkezi
Kat 3. No: 23
Tel: 322 351 42 78

İzmir
1420 Sok. Koyuncular
Apt. No. 12. Kat 5.D.5
Kahramanlar
Tel: 232 446 19 50

Mersin
Çankaya Mah. 4709 Sok. Eser işhanı Kat 1.D. 5
Tel: (0324) 237 66 49

Kerem kin, li axaftina Serok û Sokrates guhdarî bikin!..



DERKET

Kovara panzderojî (Onbeşgünlük Dergi)

■ Xwedî (Îmtiyaz Sahibî) **M. Nuri Karakoyun**
■ Koordinasyon Giştî: **Sami Tan**
■ Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu):
Mazlûm Doğan, Doğan Güzel, İmam Ciel

■ Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
■ (Yazı İşleri Müdürü) **Abdurrahman Pekedis**
■ Navnîşan (Yönetim Yeri) **İstiklal Cad. Ayhan Işık sokak.19/1 Beyoğlu/ İstanbul**

■ Tel: (212) 292 72 70
■ Fax: (212) 251 95 85
■ E-Mail: pinedank@hotmail.com
■ Kargerî (İdare) (212) 251 79 37

■ Çapxane: **Aspaş Matbaacılık**
■ Yayın Koordinasyon
Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.
■ Belavkirin **BİRYAY Dağıtım**

■ Nûnergeh: **Edene: (322) 351 42 78**
■ İzmir: **(232) 446 19 50** Mersin: (324) 237 66 49



BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Hêlin: (?) "... ji bo ku ez keçik bûm, navê min danîm Hêlin. Ezê jî li gora navê xwe mezin bûbûma. Keç stûxwar in li Kurdistanê. Keç ne tiştê in bi bîrûbawerîya mezinan. Dayikên ku keçan tînin pir tadayî dikşînin. Zaf caran mîrên wan hêwiyan tînin ser wan. Halbûkî gunehê jinan di vî tiştî de tune ye..."-Ji romana Hêlin... (OXIR BE XALÊ BAKSÎ...)

QUSXANE Ên berî nivro...



Hûn xwe wekî **Ava Zermemê** paqij û zelal û mîna **H. Samî Türk** serbilind dibînin. Lê ji bîr nekin ku **Hitler** jî xwe serbilind didît. Ne ji tîrsa me be, hûnê xwe wekî **Mesîhê Dawîn** jî îlan bikin. Xilasbûna we tune. Êdî hûn pê teoriyên **Osman Durrûs** ên genî jî xelas nabin. Xwedê dizane, wê dawîya we jî wekî ya **Hitler** bel... (xwedê bike jê xirabtir be)

MOZ Ên piştî dana pez



Gelî hevalên ber-evîndar!!!.. Van rojan hûn li dora keçeke bedew wekî di-zên çavbeq tînin û diçin. We niyet e, hûn pê re bipeyivin. Heyran, helbestekê Feqiyê Teyran bixwînin û jê re bibêjin "Ez ji te hez dikim..." (Ne hewce ye em destûrê bidin...) Lê ji qûna we nayê. Hinekî lez bikin dilê'm, nexwe piştî çend rojên din, wê keçik giliyê we bike û hûnê wekî dizan werin binçavkirin.

CASIK Ên ber êvarê...



Gelî hevalên teorîfros!!!.. Ji bo guherîna dinyayê, hûn serê xwe diêşînin. Lewma hûn wekî **Rafnera Êlihê** teoriyan (?) diafirînin. Gelek caran jî hûn rêbazên **Gandî, Marî** û **Hz Muhammed** dubare dikin. Lê heta wê saetê jî we wekî morîstaneke jî gav navêtînel! (Kero nemire qîvar şîn têt!..)

ZIRNE Ên nivê şevê...



Ji bo wê sala nû, gelek tişt di bîra we de ne. Wekî salên din we bernamê û planên xwe amade kirine û hûn jî her kesî re qala wan dikin. We dil heye, hûn di kesayetiya xwe de şoreşekê bidin dest pê kirin û pê li pê li cîvakê belav bikin. Piştî peyva şoreşê, ma em êdî diwêrin tiştêkî bêjin?!

HUDHUDK Ên heft mehi hatine...



Di her nîqaş û galegalê de, hûn bi qestî peyv û tîgehên (ev çî ye kuro!..) nenas bi kar tînin û serê hevalên xwe tevlihev dikin. Lê hûn başbaş maneya van peyvan nizanin. Eger mebesta we karîzma be, hûnê rojekê li ser gûyê xwe bêne qefaltin. Na eger quzilqurteke din be, ji me re jî bêjin. (Gelo we anlamişkîr an na!..)

GEMARO Û AJANO!..



Qehremanê me (ê nû) Gemaro diçe Spanyayê. Li Madrîdê li gagulaşê temaşe dike. Piştî gulaşê tê sûkê. Birçî bûye. Dikeve restorantekê. Ji ber ku navê xwarinan nizane, tiliya xwe li ser lîsteyê digerrîne û biryar dide ku bi navê 'cajano' xwarinekê bixwe. Gazî garson dîke û jê 'cajano' dixwaze.

Cajano tê. Ew parîyê mezin ê goştê gilover e. Piştî ku xwarina xwe dixwe, ji garson dipirse:

- Ev tiştê xweş ku min xwar çî bû?
- Hûn îro çûn meydana gagulaşê?
- Belê.
- Cajano, gunê wî gayê ku îro di gulaşê de hatibû kuştin e.

- Pîr xweş bû!

Gemaro roja din jî diçe herman restorantê û dîsa 'cajano' dixwaze. Cajano tê. Lê wê carê biçûk e. Gemaro piştî xwarina xwe dixwe, dîsa gazî garson dîke.

- Cajanoya îro çima biçûk bû?
- Kekê min di gulaşê de her tim matador bi ser nakevin!..

INTER-ABLA



ORD.
PROF.
DOÇ.
DR.
HWD.

ku, bi nexweşa xwe re raketîye. Gelek doktoran ev kar kiriye.

- Welehî min bê hemdî xwe kutayê. Pîr xweşik bû. Ez çî bikim Cîncî Abla?

- Sayin Oso Beg, dildarê min ne xem el!.. Doktor jî însan in, ew jî dikarin bi nexweşê xwe şa bin.

- Lê ez beytar im, yanê weterîner im, ne doktorê însana me Cîncî Abla.

- Qeda li te keve Oso Beg!.. Ne sûcê te ye, sûcê wan e ku tu kirine

XWIŞKA CÎNCÎ

Intertîrekên hêja!.. Niha ezê bi rîya chatê derdên we derman bikim. Belê dildarê minê hêja!.. Ez li benda peyamenê we me. Emañ ellahim ew çî ye? Wezîrê Tendurîstiyê Oso Koso dixwaze bi min bişewire.

- Belê wezîrê min, Oso Koso Beg, bêje derdan, bêjim dermanan!

- Xwişka Cîncî min qebhetek kirîye. Ez her çiqas bûme wezîr jî, nebûme mirov. Ez pîr şerm dikim, çawa bêjim, nizanim.

- Ka derdê xwe bêje Oso Beg, fedî neke! Te çî kirî? Tu çima xemgîn î?

- Îro nexweşek anîm cem min. Pîr delal bû. Çawên wê yê res, çimên wê yê stûnî!.. Dema ez û ew tenê man, min hew bi xwe karibû û min bazda serê.

- Xem nake wezîrê min!.. Helbet di cîhanê de doktorê yekem ne tu yî



wezîrê tendurîstiyê!.. Li te jî têt!.. Ji xwe diya te jî dîlegur el!.. Êêê ez çî bêjim, stûyê te bişkê Osol!.. Kes nikare mankera xwe jî emanetî te bike. Ji bo stûyê te bişkê jî, xwe ji pacê serserî bavêje jêrê!..

JÎ PÊŞEROJZANÊN MEZIN GOTINÊN MEZIN! (NE HENEK IN!)

"Pêşeroja radyoyê tune ye" **Lord Kevin/ Zanistê fizîkê ji skoçyayî**

"Edî tiştêkî nû tune ye. Hemû tişt hatine îcat kirin." **Charles H. Duell/Serokê Daire ya Patentan 1899**

"Min fahm nekir, keştiyên binavê wê ji çî karî re bibin. Herî zêde wê muretebatên wan di bin avê de bifetisin." **H. G. Wells/ Nivîskar 1901**

"Wê hesp her tim bêne bikarînin. Otomobil jî encax dikare bibe modayêke muwaqat." **Mudurê Banqaya, ku li ser daxwaza qrediyê ya Henry Ford raportek amade kiribû 1903**

"Balafir pêlîstikên xweş in. Lê buhayê wan ê leşkerî nîn e." **Maresal Ferdinand Foch, Serokê Artêşa Fransayê di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn 1911**

"Wê kî bixwazê gotinên lîstikvanan bibihîse?" **Harry M. Warner, Rêvebirê endustriya filman. Axaftina wî ya li ser filmên bideng 1927**

"Telewîzyon herî zêde wê di nav şex mehan de ji holê rabe. Wê kesek nexwaze her şev li qutiyekê wiha binêre." **Daryik F. Zanuck, Serokê Twenty Century Fox 1944**

"Qompîter wê di pêşerojê de belkî 1,5 ton giran bin." **Kovara Popular Mechanics 1949**

"Min sounda wan neceband, her wiha modaya grûbên gîtarê jî derbas bû." **Rêvebirê Decca Record Plak, di derbarê Beatles de diaxwe 1962**

"Ji bo gelek însanan kişandina titûnê tiştêkî bisihet e." **Dr. Lan G. McDonald Operator 1963**

"Ez sedemeke nabînim, ku însan di mala xwe de qompîterê bi kar bînin." **Kenneth Olsen, Serokê Digital Equipment Corp 1977**

MAHMÛD BAKSIYÊ KÛ JI
KEVIR Û KUÇAN RE JÎ
QALA DOZA KURDÎ KIR,
NIKARÎ LI WELATÊ XWE JÎ
BIMRE! OXIRA XÊRÊ BE
XALÊ MAHMÛD!...

HEYRAN
HINEKÎ BÛSEKININ.
DIVÊ EZ LI JOR
JÎ JI YEKÎ RE BEHSA
DOZA KURDÎ BIKIM!...



A. GİÇEK * CICI